Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1261 | 2-Nîsan-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Dêrik; Mînaka jiyana hevbeş

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Nivîskarê kurd Melevan Resûl diyar kir ku bajarê Dêrikê mînaka xweşikûbûn û jiyanan hevbeş ya Rojavayê Kurdistanê ye. Herwiha Melevan da zanîn ku Dêrikê dewlemendiya çandî û civakî ya herêmê vedibêje.**

Di derbarê dîroka avabûna bajarê Dêrik, xweşkbûn û dewlemndiya çandî û hevgirtina gelên bajêr, nivîskar û rojnamevanê kurd Melevan Resûl bersiva pirsên Rojnameya me da, hevpeyvîn wiha bû:

**Navê bajarê Dêrikê ji kur hatiye û dîroka avabûna wê vedgere çi salê?**

Navê Dêrikê hevedudanî ye ji Dêr û Yek pêk tê, yanî dêreke xirstiyanan têde hey. Di herêma me de gelek nav bi vî rengî hene. Dêrika Hemko li Rojavayê Kurdistanê ye, Dêrika Beravê û Dêrika Çiyayê Mazî heye ev hemû ji dêrê tê, cihê perestgehê. Lê dema ku em vegerin li dîrokê, ev dêr çîrokeke wê heye, ev dêr wek xirbeyek bû çend caran hatibû avakirin û careke din xira dibû. Her wiha hin dibêjin navê Dêrik lê hat kirin ji ber ku du rê lê hene. Di heman demê de çima nav lê hatiye kirin Dêrika Hemko, dêr ya xiristiyaniya ye û hemko navekî misilmanaye ev yek çawa hevdû digre. Dema berê de dêr wek xirbeyekî bû û li kêleka wê kaniyek hebû rêncber û gavanan sewalê xwe tanîn li ser wê kaniyê, li wê xirbeyê çend dar hebûn, gavanê ku li wê xirbeyê dima navî wî Hemko bû lewma kirin Dêrika Hemko.

Avakirina Dêrik wek bajar, xirbeyek bû û destpêkê gundê Girzerk ava bû, lê niha ev gund jî bûye taxek ji Dêrikê. Dema şerê Firensiyan û Birîtaniyan de, Imbiratoriya Osmanî hildiweşe, êdî Ferensî derbasî van cihan dibin û ji bo xwe navend ava kirin. Heya niha jî navlêkirina Zexîre vedgere cihê leşkerî, hin bi hin hatin heya gihan bajarê Dêrikê, li vir wargehekî leşkerî ava kirin jê re Qijle tê gotin. Di sala 1931'an de dest bi avakirina bajar kirin û weke navendekê bi kar anîn navê Qeza Dicle li Dêrikê kiribûn. Destpêka avabûnê ji Qijlê dest pê kiriye ku ji kevirê reş hatiye avakirin, bajarê Dêrikê bi axa asor û kevirê xwe yê reş tê nasîn. Bi vî rengî dest bi avakirina bargehên rêveberiya sîstema bajarvaniyê kirin. Dêrik gelek kolanên wê yên kevin û teng hene û ev yek vedgera dema berê. Kesên ku berê xwe dan Dêrikê



kesên karmend û bazirgan bûn û êdî Dêrik bû navenda bazirganî, leşkerî, xwendin û rêveberiya kar û xebatên gel. Kesên welatî yên ku ji fermana Osmaniyan bazdan û berê xwe dan bajar û bajar ava kirin kesên siryan, ermen, kildan û biqasî wan kurd jî hebûn û di vê heremê de belavbûn, him li gundan û him jî li bajêr. Lê yê ku Dêrik ava kir kurd û siryan bû, hêdî hêdî ji xirbeyekî ber bi bajar ve birin. Dema dewleta Sûrî hat avakirin êdî sîstema dewletbûnê cihê xwe girt di bajar de.

**Dêrik bi çi tê naskirin û çend netew cihê xwe tê de digrin?**

Dêrik bi pir netewên xwe tê naskirin û têde kurd, ermen, siryan, kildan û di dema dawiyê de jî çend malbatên şerabî jî hatin û lê bi cih bûn. Lê sîstema Baas erebkirina herêmê kire armanc û xwestin kevneşopiyên kurdî ji holê rakin û yên erebî li şûna wan bi cih bikin. Lewma kembera reş avakirin û 32 gundên erebên mexmûrî di vê herêmê de ava kirin. Ji Dêrikê heya Amûdê zeviyên cotkaran bûn û ji wan standin û dan ereban û li vir bi cih kirin. Guherîn û veguherîna demografîk ya ku hat çêkirin li ser du qonaxan bû, yek di dema Cemal Ebdulnasir de bû û di sala 1967'an de hat çêkirin. Di heman demê de jî dema yekîtî di navbera Sûrî û Misir de hat çêkirin di wê demê de pirojeya erebkirina herêmê dest pê kir. Gundê Zihîriyê û Elehmediyê yek ji pirojeya wan bû ku kesên Misrî li van herdu gundan bi cih bike. Lê ev piroje neçû serî ji ber ku yekîtiya di navbera Sûrî û Misir de hilweşiya. Rêjeya kurdan ji sedî 70'î ye di bajarê Dêrikê de, piştî kirîza Sûrî jî gelek penaber li vir bi cih bûn.

**Bajarê Dêrikê di milê demografî û xwezaya xwe de bi çi navdar e?**

Dêrik bi xweza û cihê xwe yê istratîjîk navdar e. Ew li ser sînorê sê dewleta ye, Iraq, Tirkî û Sûriyê. Di heman demê de çemê Dicle jî têre derbas dibe, gelek çîrokên vî çemî hene ku destan li ser hatine çêkirin û qehremanî hatiye kirin. Ji aliyê dîrokî ve jî gelekî kevnar e, gir gelek têde hene, navê piraniya gundewarên wê girin wek; Gir zerik, Girzêrîn û hwd, ev gir vedgerin demê mîtaniyan, aşûrî, gildanî û someriyan de ku hatine avakirin. Herêma Mezopotamiya gelekî kevn e, gelek şaristanî têde hatine çêkirin. Her wiha di milê xwezayê de di Dêrikê de çemê Dicle heye, pira Bafid û Qijle. Di milê demografî de çiyayê Bêxêr li Rojhilate dikeve li ser sînorê Rojava, çiyayê Cûdî di bajar de tê xuyanî kirin û çiyayê Qereçox jî lê heye. Gelek çem û bendav li vê herêmê hene, wek bendava Başotê, Borzê û Sefan. Ava vir şêrîne him ji bo vexwarinê him jî ji bo çandiniyê baş e. Gel ji tevahî Sûrî di buharan de berê xwe didin vê herêmê, ji ber ku him dar, ax û kevirên wê yên reş balkêşin. Ev kevir jê re yên baziltî tên gotin ev yek



dihêle taybetmendiyeke herêmê ya cûda hebe. Piraniya xelkên herêmê bi çandinî û bazirganiyê ve mijûl dibin, di heman demê de betrola ku li vê herêmê derdikeve qalîteya wê gelekî başe. Xelkên Dêrikê civakbûn li cem wan heye dema şahiyek û şînek çêdibe hemû li hev kom dibin û bi wî rihê komînal tev digerin.

Bi kamîreya Birûc Resûl



## FERHENGA BIWÊJAN

**Bila ez keça te bim:**
- Bi heman wateyê..

**Bikeve zikê diya xwe xilas nabe:**
- Xilasbûna wî nîne; bi kû ve biçe wê bê girtin.

**Çavên sor nîşanî wî dan:**
- Reş danê; peyam dayê ku wê zererê bidiyê.

**Çavê xwe lê sor kir:**
- Tirsand; gef lê xwarin; reş danê; peyameke hişk dayê

**Çend û çend ji te re:**
- Tu pir bi ser xwe ve çûyî, ezê te bikujim.

**Daqoqê himandî ye:**
- Gef e, tehdîd e; şûrê demokles e.

**Destê xwe bide serê xwe:**
- Ez te haydar dikim; ez ne honik im; tu nikarî barê min rakî.

**Devê min veneke:**
- Wisa neke ku biaxivim; ez biaxivim ezê giran biaxivim; gelek tiştên te ku bêjim hene.

**Di bin ebayê xwe de serê kopalê xwe nîşan da:**
- Reş danê; tirsand; da xuyakirin ku wê zererê bidiyê.

**Didanên xwe lê disîqirandin:**
- Pir xeyidîbû; sondikên wî dixwarin.

**Didanên xwe lê diçîrikandin:**
- Bi heman wateyê.

**Didanên xwe lê qiriçandin:**
- Bi heman wateyê.

**Didanên xwe lê sûtin:**
- Bi heman wateyê.

**Dinya fireh e:**
- Ez vê ji te re nahêlim; emê rojekê hev bibînin.
(Dema yek xirabiyekê bi yekî dike, yan dema yek muhtacê yekî dibe û daxwaziya wî pêk nayne yê din hingê dibêje)

**Dinya ne şev û rojek e:**
- Tuyê jî rojekê muhtacê min bibî.
(Dema yek muhtacê yekî dibe û daxwaziya wî pêk nayne yê muhtac hingê dibêje)

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'YPJ'ê di cîhanê de bûye hêza jinên serfiraz'



**Fermandara YPJ'ê Çîçek Zagros destnîşan kir ku bi felsefeya Rêber Apo û berxwedaniya Kobanê YPJ'ê mohra xwe li rûpelên dîroka têkoşînê xist û wiha got: "Êdî jin YPJ'ê ji xwe re weke modelekê bingeh digre û têkoşînê dike." R-2**

## Zîwer Şêxo: Kiryarên li Beravê qirkirina mirovahiyê ye




Rojnamevan û yek ji çavdêrên karwanên alîkariyê Zîwer Şêxo anî ziman ku gelê Elewî li ber çavê cîhanê tê qirkirin û got: "Ji bo komkujî neyên belgekirin, nahêlin ku dezgehên ragihandinê derbasî Berava Sûriyê bibin."**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1261 | 2-Nîsan-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# 4'Ê NÎSANÊ NÛVEJÎNBÛNA ROJÊ YE

4'ê Nîsanê, Rojbûna Rêberê Gelan Abdullah Ocalan ji bo tevahî gelên azadîxwaz roja jinûve zayîna civakî, çandî, fikrî û jiyaneke azad e. Ev rojbûn di Rojhilata Navîn de, ji bo gelan serdemeke nû, jiyaneke nû, felsefeyek nû, fikrekî nûjen û heqîqeta mirovê azad afirand û belavî cîhanê tevahî bû. Di roja îro de fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan li ser bingeha paradîgmaya Netewa demokrtîk ji bo gelên cîhanê bûye çavkaniya hêvî, bawerî û nîşaneya jiyaneke wekhev û azad.**R-3**



## Rojbûna Me Pîroz Be!

4'ê Nîsanê ji bo gelê Kurd ne tenê rojbûne, di heman demê de dîrokeke sembolîk a têkoşîna azadiyê ye. Rojbûna Rêber Abdullah Ocalan, weke roja ku berxwedan, fikir û paradîgmaya ku di şexsê wî de şîn bûye, watedar dibe.**R-5**

## 'Kêfo Osman çavkaniya dilsozî û wêrekiyê bû'




Kurê şehîd Kêfo Osman Hogir Osman û hevalê wî Hisên Osman diyar kirin ku şehadeta Kêfo Osman ji bo her kesê ew naskiribû, bû cihê xemgîniyê û wiha gotin: "Em ji Kêfo Osman fêrî dilsozî, biryardarî û wêrekiyê bûn."**R-6**

## 'Em ê di hemû qadan de govenda azadiyê bigerînin'



Endama Koma Dayikan ya Govendê Zozan Mislim diyar kir ku ew jinên Kobanê xwedî li govenda Kobanê ya resen derdikevin û her dem di mêjî û bîra civakê de zindî dihêlin û got: "Divê hemû dayik kar bikin û çanda bajarê xwe biparêzin, xwedî li destkeftiyên jinan derbikevin."**R-7**

Jin tê avakirin
Nehîr pale R-2


Derew, hîle û çokdanîn...
Farûk Sakik R-5

Pêdiviya mezin bi çalakiyên ronakbîriyê heye
Zekî Bedran R-5

# ‘YPJ’ê di cîhanê de bûye hêza jinên serfiraz’

Fermandara YPJ’ê Çîçek Zagros destnîşan kir ku bi felsefeya Rêber Apo û berxwedaniya Kobanê YPJ’ê mohra xwe li rûpelên dîroka têkoşînê xist û wiha got: “Êdî jin YPJ’ê ji xwe re weke modelekê bingeh digre û têkoşînê dike.”

**Jîn Hisên/Qamişlo**

Derbarê salvegera damezirandina YPJ’ê û girêdayî wê rojbûna Rêber Abdullah Ocalan, Fermandara YPJ’ê Çîçek Zagros ji rojnameya me re axivî û salvegera YPJ’ê û rojbûna Rêber Abdullah Ocalan li tevahî jinên berxwedêr û gelên azadîxwaz pîroz kir.



**‘Jidayîkbûna Rêber Apo vejîna hêza jinê ye’**

Çîçek Zagros destnîşan kir ku jidayîkbûna Rêber Abdullah Ocalan di sala 1949’an de li gundê Amara vejîna cîhan û hêza jinê bû û wiha anî ziman: “Jidayîkbûna Rêbertî hebûn, nûbûn û têkoşîn bû, ji bo ku jin karibe xwe îfade bike û pêşengtiyê bike, ji dasthilatdarî, tundî û sîstema kapîtalîzimê xelas bibe Rêber Apo di pirtûkên xwe de felsefeyek ava kir da ku jê re bibe riya têkoşîn û berxwedaniyê. Çanda ku Rêber Apo lê jiyan kiriye girêdayî çanda Neolotîk ya dayiksalarî ye, têkoşîna Rêber Apo ji çanda dayiksalarî girtiye, ji ber vê yekê giranî da têkoşîn, hebûn û rêxistinbûyîna jinê, li ser vî esasî em rojbûna Rêber Apo ji bo xwe vejînekê dibînin, ne tenê ji bo jina kurd raste di serî de weke jinên kurd digrin dest, lê di şexsê jina kurd de tevahî jinên cîhanê ku ji bo azadiya xwe têkoşîn dikin. Jinê di qadên siyasî, leşkerî û qadên cur bi cur de xwe bi rengê jinê ku hebûna xwe îfade bike û zemîneke jê re ava kir. Mîmarê azadiya jin Rêber Apo ye, em ê têkoşîn bikin da ku ev sal bibe misogeriya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo.”

**‘Jin YPJ’ê ji xwe re esas digre û têkoşînê dike’**

Çîçek Zagros wiha domand: “Di êrişên DAIŞ’ê de ku dixwest zihniyeta xwe ya tarî û li dijî mirovahiyê di şexsê jinê de cîhanê bi giştî tarî û tune bike, li hemberî van terorîstan bi felsefeya azadiyê YPG û YPJ’ê li hemberî wê serî rakirin û heya dawî şer kirin. YPJ’ê pêşengtiya berxwedaniya yekemîn ya Kobanê ku xeternak komên terorê DAIŞ’ê şikenand; kir. Ev cesaret, îrade û têkoşîn bi saya felsefeya Rêber Apo bû ku di seraserî Rojhilata Navîn de yekemîn car bi hêza jinê bawer bûn, ev îrade hişt ku DAIŞ’ê bişkîne û ew çarçefa reş ku li ser jinê ferz dikir rakir. Berî şoreşa Rojava gelek şoreşên din hebû bi pêşengtiya jinê lê hêzeke leşkerî ya jinê tune bû, bi felsefeya Rêber Apo û berxwedaniya Kobanê YPJ’ê mohra xwe di cîhanê de xist û bû nasnameya cîhanê, êdî her kes YPJ’ê ji xwe re weke modelekê esas digre û têkoşîn dike.”

Çîçek Zagros wiha lê zêde kir: “Jinan bi rojbûna Rêber Apo xwe nas kirin û bi têkoşîna wî bûn sembol di cîhanê de, lewma bi rihê şoreşa Rojava û 4’ê Nîsana 2013’an YPJ’ê di heman dîroka rojbûna Rêber Apo konferansa yekemîn a YPJ’ê li Dêrikê raghand.”

**‘Bi bedelên giranbuha wê azadî were bidestxistin’**

Çîçek Zagros diyar kir ku şerê herî mezin ê azadiyê ye û wiha berdewam kir: “Azadî ancex bi berdelên buha were bidest xistin, YPJ’ê ev 13 salin asta xwe ya têkoşînê li hember teknîka dagirkeriya Tirk an jî hêzên hegemonîk gihand zîrva xwe, tecrûbeyên 13 salan di warê rêxistinî hem xwerêxistinkirin, perwerdekirin, xwezanekirin û teknîkê de YPJ’ê xwe pêşxistiye, li hember teknîkên ku li dijî gelê me pêk tê dibin bersiv û teknîka dijmin vala derxistiye, YPJ’ê di hemû rê û rêbazên teknîk û istratîjîk de rol lîst. Ji bo parastina gel YPJ’ê bû singer û li ser vî esasî di asta cîhanî de bûye model û hêza jinên serfiraz.”

Çîçek Zagros wiha got: “Berxwedana ku li hemû deveran li ser asta Dêr Hafir û Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê û di çiyayên azad de heman berxwedan tê meşandin, em vê rojê li wan pîroz dikin. Bangewaziya Rêber Apo ya dîrokî misogeriya aştiyê ye ji bo tevhaî netewan. Li ser esasê pêngav û bangawaziya Rêber Apo pêşengtî û têkoşîna wî divê xurtir bikin û bangawaziya aştî, demokrasî, wekhevî û bratiya gelan esas bigrin, em ê sala 2025’an bikin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û tevahî gelan. Em tekez dikin ku di şexsê jinê de wê civak jî azad bibe û em ê wisa têkoşîna xwe berdewam bikin.”

# ‘Di pergala heyî de xweparastina jinê, bingehe’

**Viyan Egîd/Qamişlo**

**Rêveberiya HPC-Jin a bajarê Kobanê Edila Bekir diyar kir ku pêwîst e jin bi xwe parastina hebûna xwe bike û li benda kesî nemîn e û wiha got: “Ya ku jinê diparêze jin bixwe ye, ji ber vê yekê divê jin parastinê ji xwe re bingeh bibîne.”**

Jin, tevî hemû pirsgirêkan û êrişên li ser tên meşandin, çavkaniya jiyanê ye, jin ji tinebûnê hebûn diafirîne. Tu caran koledariyê qebûl nake ku bibe qurbanî, ew mîna werzên salê ye herdem xwe nû dike. Vîna wan bi kerasetan nayê şikandin û di ferhenga jiyana wan de tu carî teslîmiyet tune ye.

Derbarê jin û parastinê de Rêveberiya HPC-Jin a bajarê Kobanê Edila Bekir ji Rojnameya me re axivî.

Edila Bekir di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser peyama Rêber Apo a ji bo jinan şandibû û wiha got: “Peyama Rêber Apo ji bo me cihê kêfxweşiyê ye. Rola Rêber Apo di gerdûnîkirina têkoşîna azadiya jinê de pir diyar e. Her wiha armanca têkoşîna azadiya jinê jî pêşxistina azadiya fîzîkî a Rêber Apo ye. Em bi vê wesîleyê Rêber Apo ji dil û can silav dikin. Silavên Rêber Apo ji bo me wê bibe sedema pêşxistina têkoşîna azadiyê. Bê guman wek tê zanîn û dîtin di van şeran de jin rastî tundiyên curbecur hatine. Ji hêla derûnî ve zirarên mezin dibînin. Li beramberî vê pêwîstî bi xurtkirina têkoşînê heye.”

**‘HPC`ê li dijî şidetê têkoşîna xwe bilind dike’**

Edila diyar kir ku ya herî girîng û sereke ew e ku jin bikaribe li hember her cûreyên êrişên pergalê xwe biparêze û wiha pê de çû: “Îro di nava civakekî de xwe parastin girînge û bi taybet wekî jin pêwîste xweparastin ji xwe re bingeha jiyanê bibîne. Li Rojava li ser beşên waletparêzî, parastina cewherî û dîroka parastina cewherî perwerdetên dayîn. Ji ber ku parastina cewherî ji bo me pêdivîyeke ku êdî nema dest jê tê berdan. Di nava civakê de pergala desthilatdariya mêr bi bandor e. Ji ber vê bê qanûnî û bê edaletî tê jiyan kirin. Gelek êriş li ser bedena jin tên kirin. Perwerdeyên ku tên dayîn ne tenê ji bo civak xwe biparêze, ya herî girîng û sereke ev e ku jin bikaribe li hember her cûreyên êrişên pergalê xwe biparêze. Yek ji rola sereke a hêzên parastina civakê jî parastina her cûre nirx û hebûna jinê ye.”

**‘Em ê bi hêz, îrade û tilîliyên dayikan serbikevin’**

Edila Bekir di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Li dijî pergala desthilatdar ger jin parastina xwe a cewherî pêşnexe wê bê parastin bimîne. Ji ber vê pêdiviya jin bi pergala parastina cewherî heye. Eger nekare pergala parastinê bide rûnişkandin, ew ê azaiya xwe bidest nexin. Ji ber vê HPC’ê garantiya jiyanê ye. Pêwîst e jin parastina hebûna xwe bike. Divê li benda kesî nemîne ji bo ku bi vê erkê rabe. Em dibînin ku çawa dagirkeriya Tirk êrişên xwe li ser herêma Bakur û Rijhilatê Sûriyê zêdetir dike û çawa jina pêşeng dike armanên êrişên xwe, heya roja îro ev êriş didomin, her wiha niha li bendava Tişrîn ku dayik û jinên ciwan xwe kirine mertalê



parastinê tenê ji bo dagirkerî neyê ser axa wan. Em ê bi hêz, îrade û tilîliyên dayikan bi serkefin.”

**‘Yekîneyên Parastina Jinê ji bo jiyanê pir girîng e’**

Rêveberiya HPC-Jin a bajarê Kobanê Edila Bekir di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku Yekîneyên Parastina Jin YPJ`ê ji bo tevahî jinan hêz e û pir girînge û wiha domad: “YPJ`ê fêrî hemû jinan kir ku xweparastin tişta herî esas e. Em hemû jinên ku ji bo parastin û azadiyê canê xwe feda kirin, bi bîr tînin û ew ji bo me bûn hêz û sembola jiyana azad. Yekîneyên Parastina Jinê ji bo jiyanê pir girîng e. Ji ber ku ya jinê diparêze jin bixwe ye. Îro jin bi vê hêza mezin re bihêztir bûne. Em careke din bêjin, li hemberî ew destûrên zordar, em ê pergala jinan ava bikin.”

**Ji Pênûsa Jin**

## Jin tê avakirin

**Nehîr Pale**

Rêber APO bi boneya roja Cîhanî ya Jinên Karker (8`ê Adarê) name ji bo hemû jinan rêkir. Di nameya xwe de têkildarî pêşxistina xebatên jin gelek mijaran tîne ziman. Yek ji wan mijaran jî jin li gorî kîjan pîvanan were nirxandin. Rêber APO dibêje: `Jin divê ne li gorî pîvanên biyolojîk, li gorî pîvanên çandî, civakî û dîrokî were nirxandin`. Her wiha Rêber APO têkildarî heman mijarê gotina Simone de Beauvoir bibîr tîne. Simone de Beauvoir çalakvaneke siyasî ye, ji Ferensa ye, bîrkarî û felsefe dixwîne, piştre dibe nivîskar. Li ser jinê gelek lêkolîn dike û pirtûkan dinivisîne. Di salên heftê de dibe çalakvaneke siyasî û ji bo mafên jinê têdikoşe. Rêber APO gotina Simone de Beauvoir ku dibêje:`Jin dema ji dayîkdibe ne jine, piştre tê ava kirin û dibe jin` bibîr tîne. Civaka zayendperest bi rêbazên xwe heyanî ku jin bimre destûr nadin wê ku weke jinekê hîs bike û bifikire. Ji ber ew jineke mîna mêr difikire, çêdikin. Ev jina bi destê civaka zayendperest tê çêkirin, yeke bêçare ye, cûdahiya wê ji mêr nîne. Heyanî ku xwe neguhere ew ê nikaribe jiyanê ava bike û pirsgirêkan çareser bike. Jina di encama zîhniyeta mêr de mezin dibe, anceq bibe qurbana şer û pevçûnên diqewim in. Ew ê nikarbe têbikoşe, rûmet û hebûna xwe biparêze. Ew ê bermalî be, çarenûsa jêre diyar dikin, qebûl bike û eger tehemul neke wê dawiyê wê bighînin asta ku di mirinê de çareserî bibîne û xwe bukjê. Jin dema ji dayîkdibe hîna temenê wê nebûye 4 sal wê fêrî koletiyê dikin, çavên wê ditirsîn in. Jin heyanî ku fîzîkî saxe weke jin xwe nasnake û di xizmeta mêr de ye. Exlaq û pîvanên ku civaka zayendperest ji jinê re diyar kirine, divê ji neslekî derbasî neslê dîtir bibin. Ji bo zagon û qalibên mêr wenda nebin û berdewam bikin, vê yekê dixin sukra jinê de. Li gorî pîvanên wan jina herî baş ya ku parastina rêzik, zagon û qalibêjin civaka zayendperest dike. Ev jin nabe jin, tenê fîzîkî saxe û ew di ruh de miriye. Dibe ku ev jin xwe di nava civaka xwe de ya herî baş diyar bike, lê belê di hundirê xwe de ji rewşa xwe ne razî ye û her tim hêvî dike ku bimre. Jinê dighînin rewşa ku bê hêvî bimîne û li benda mirina xwe be. Jin bi giştî di hundirê xwe de ne rehetin, hîs dikin ku jiyana wan ne raste û her tim wicdanê wan têşê. Di aliyê piskolojîk de nerehetin. Li ser asta cîhanî dibe ku bi milyonan jin vê yekê hîs dikin û berê xwe didin mirinê.

Gelek jinên feylesûf, çalakvanên siyasî, hunermend, nivîskar û şoreşger li hemberî zayendperestiyê çareserî di têkoşînê de dîtine û heyanî roja îro têdikoş in. Ji bo jin were ava kirin Rêber APO gelek rê û rêbaz danîne holê, zanebûn, têkoşîn, berxwedanî, xwebûn, siyaset, daxwaza azadiyê, guhertin û veguhertin, ev hemû riyên ku jin dikare pirsgirêkên xwe pê çareser bike û bighîje asta xwedawendbûnê.



# ‘Em ê di hemû qadan de govenda azadiyê bigerînin’

Endama Koma Dayikan ya Govendê Zozan Mislim diyar kir ku ew jinên Kobanê xwedî li govenda Kobanê ya resen derdikevin û her dem di mêjî û bîra civakê de zindî dihêlin û got: “Divê hemû dayik kar bikin û çanda bajarê xwe biparêzin, xwedî li destkeftiyên jinan derbikevin.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Koma ku ji 12 jinan pêk tê, hemû jî dayik in û dixwazin çand û folklora ji dapîr û dayikên xwe birine biparêzin da ku tune nebin. Her wiha wekî dayikên Kobanê bi riya pêşkêşkirina van govendan hewl didin ji bo nifşên pêşerojê çanda xwe bidin nasîn. Koma govendê bandoreke mezin li civakê dike ji ber cudahiyek di navbera Koma dayikên Kobanê ya govendê û komên din de heye. Her jinek di koma dayiokan de cilê folklorî yê dayikan li xwe dikin ku dinava wan de dayikên temen 50 salî hene, nûnertiya adet teqalîd û çanda bajarê Kobanê dikin. Ew bi van cilan bi serfirazî derdikevin ser dikê. Taybetmendiya wan jî ew e ku ji şêniyên Kobanê re govenda Kobanê ya kevin pêşkêş dikin.

Derbarê Koma Dayikên yê Govendê a bajarê Kobanê, Endama Koma Dayikan Zozan Mislim ji Rojnameya me re axivî.

**‘Em ê xwedî li govenda Kobanê ya resen derş kevin’**

Zozan Mislim di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku ez yek ji jinên ku xwe di Koma Dayikan de digirin yên kantona Kobanê û wiha



got: “Armanca Hîlala Zêrîn ew e ku ji nû ve çand û folklora xwe zindî bikin. Îro em jî wek dayikên Kobanê dixwazin xwedî li çanda xwe derkevin da ku çanda me neyê windakirin. Em ê bi hemû beşên xwe yên hunerî tevlî şahiyan bibin. Bê guman di dema Rejîma Baas`ê de me nikaribûn bi dengê bilind biaxivin an jî stranan bibêjin, derfet li pêşiya me tunebûn. Lê di roja me ya îro de her kes berê xwe dide Hîlala Zêrîn cihê muzîk, govend, helbest, şano û bi awayekî serbest deng û hestên xwe derdixin. Bêyî ku kes astengiyan li pêşiya me derxe. Pêşxistina çanda dayiksalar bi sedan salan e bi polîtîkayên pişaftin û qirkirinê re rû bi dimîn e. Bi taybetî di vê dema ku em dibînin dewleta Tirk êrişeke mezin li hemberî çanda me daye destpêkirin de hewl dide çanda me ya resen û bi taybetî jî govenda Kurdî ji holê rake û tune bike. Em jî weke jinên Kobanê xwedî li govenda Kobanê ya resen derdikevin û her dem di mêjî û bîra civakê de zindî dihêlin.”

**‘Dil, mêjî, ruh û hestên me li derdora azadiyê dicivin’**

Zozan balkişand ser koma Govenda Dayikan û parastina çanda daiyan û wiha domand: “Ji her demê zêdetir ziman, çand û hunera Kurdî li pêş e, yên ku pêşengiya pêşxistina vê yekê jî dikin jin û ciwan in. Bi taybetî dema em vê govendê digerînin dil, mêjî, ruh û hestên me li derdora azadiyê dicivin. Bi salan e dewleta Tirk a dagirker dixwaze çanda dayika kurd tune dike, civaka Kurd di hemleyên qirkirinê re derbas dike lê bê encame. Berovajî, Kurd ji berê zêdetir xwe ji pencên qikirinê diparêzin. Em ê jî bi hezaran jin bi tilîlî, cil, stran û govenda xwe her dem li ser piyan bin û li dijî polîtîkayên dewleta Tirk bêbersiv nemînin. em derdikevin ser dikê ji bo govenda xwe pêşkêş bikin em bi hezkirina kesên amade û rêzgirtina wan a ji bo me hîs dikin. Di her rojên diyar de gel li bende me ye. Em bi vê yekê serbilind in û hewl didin zêdetir xwe perwerde bikin da ku tiştên baştir pêşkêş bikin.”

**‘Çanda dayikê wê tu carî neyê qirkirin’**

Endama Koma Dayikan a Kobanê Zozan Misim di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku ji vir û şûnde jî wê gerandina govendê bibe rêbazeke me ya têkoşîna li dijî dagirkerî û qirkirinê û wiha pê de çû: “Govend ji mafên herî rewa yên civakan in ku bikarbin hebûn û hestên xwe pê



raber bikin. Bi taybetî jî tê zanîn ku ciwan çiqas bi gerandina govendê ve girêdayî ne, kêfxweşî û coşa xwe bi wê tînin ziman. Ji bo vê jî dewleta Tirk tundî û polîtîkayên taybet li ser ciwanên li ser kurdan bi kar tîne. Ev yek rastiya dewleta Tirk û heta tirsa wan a ji çanda me ya resen nîşan dide. Govenda Kurdî çandeke kevnar e, mirov dikare weke mîrateyeke têkoşîn û berxwedanê jî bigre dest. Em van govendan bi govendên azadiyê bi nav dikin lewra yên ku bixwazin gerandina me ya govendê qedexe bikin, ew di heman demê de azadiya me jî qedexe dikin. Ji bo vê jî bi taybetî weke jin em ê bi gerandina govendê li tax û kolanan bersiv bidin dewleta Tirk. Çanda dayikê tu carî wê neyê qirkirin, berovajî wê em ê bi govend û dîlana azadiyê li dijî qirkirina heyî têbikoşin û li ser piyan bin. Êdî ji vir û şûnde jî wê gerandina govendê bibe rêbazeke me ya têkoşîna li dijî dagirkerî û qirkirinê.”

# ‘Ji bo pêşxistina qada hunerî xebat tên kirin’

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Hevseroka TEV-ÇAND’ê Sumeya Mihemed destnîşan kir wan weke qada hunerê xwestin ku têkiliyên xwe bi hunermendên herêmên Sûriyê yên din xurt bikin, da ku bi hev re kar û xebatên hevbeş bidin meşandin û qada hunerî pêş bixin.**

Derbarê serdana hunermendên herêmên din yên Sûriyê ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê re hevseroka TEV-ÇAND’ê Sumeya Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Hevseroka TEV-ÇAND’ê Sumeya Mihemed di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku di meha Adarê de gelek hevdîtin bi hunermendên herêmên Sûriyê yên din kirin û wiha got: “Bi armanca bi hev re kar û xebatên hunerî bidin meşandin, piştî hilwişandina rêjîmê guhertin di her alî de çêbû, weke TEV-ÇAND’ê me jî xwest guhertinan di qada



hunerî de çêbikin û têkiliyên xwe bi hunermendên herêmên Sûriyê yên din çêbikin, komîte hate ava kirin 4 kes hatin hilbijartin weke têkiliyên dîbolmasî ji bo serdana Şamê bikin, li wir hevdîtin bi hineke derhêner, hunermend û lîstikvanan re hatin kirin, ji xwe hunermendan jî xwestin serdana herêmên me bikin, ev yek hat bi rasthatina Newrozê me ew vexwendin ji bo tevlî cejna Newrozê bibin hem jî lêgerîna wan di Rojava de çêbibe û xebatên çandê bibînin, weke her kesî dît hunermend Semîh Şiqêr tevlî şahiya Newrozê jî bû.”

**‘Hevdîtin bi awayekî serkeftî derbas bûn’**

Sumeya Mihemed tekez kir ku hevdîtin hatin kirin bi awayekî serkeftî derbas bûn û wiha berdewam kir: “Di serdanê de hunermend Semîh Şiqêr di nava saziyan de hate gerandin bi taybet saziyên hunerî, herwiha serdana Pemangeha Bilind a Hunerî li Dêrikê û Hunergeha Welat kir, kêfxweşiya xwe anî ziman ku çawa di rewşeke zehmet de Akadîmiyeke wiha hate vekirin.”

Sumeya Mihemed wiha pê de çû: “Di hevdîtinan de vekirina kargehên mûzîkê hatin nîqaş kirin, dibe ku di meha Gulanê de dest bi vê xebatê bê kirin û hunermend Semîh Şiqêr jî tevlî vê xebatê bibe, herwiha derhênerê Sûrî Dr.Ecac Selîm jî pêşîniyar kir ku cihekî ji bo Sînamayê jî çê



bibe weke Holyood, herwiha di milê mûzîka fîlim û Sînama de jî wê karê hevbeş bê kirin, gelek projeyên din wê di demên pêş de bên bi cih anîn.”

Sumeya Mihemed di dawî de wiha anî ziman: “Nîqaşên pir bi wate û encam hatin kirin, hunermendan amadekariyên xwe ji bo pêşkêş kirina alîkariyê di warê hunerî de nîşan dan, lê belê demeke jê re pêwîste ku bê pêkanîn, hunermendan destnîşan kirin ku derfetên me pir hene li herêmê lê xwedî derketineke jê re divê. Di demeke nêz de wê ev xebat bên meşandin, bi wan re hineke lîstikvan weke Mihemed Oso û hwd. Weke TEV-ÇAND di naskirina wan hunermendan em kêxweşbûn, me gelek lîstikvan nas kirin, di dema pêş de wê serdan zêdetir bê kirin ne tenê ji bo Şamê lê herêmên Sûriyê yên din.”

# Li hêviya edalet û cezakirina sûcdaran

Di dema dawî de hêzên girêdayî desthilatdariya Şamê li dijî pêkhateya Elewî li berava Sûriyê komkujiyên mezin pêk anîn, Di encamê de bi sedan, jin, zarok û kesên temen mezin jî hatin kuştin. Yek ji dayikên elewî ku kurên wê li ber çavên wê hatin kuştin û navê sindiyana beravê lê hate kirin; Zerga Sebahiya ye.

**Navenda Nûçeyan**

Piştî xilasbûna ji rêjîmeke diktator, êdî Sûriyê kete qûnaxeke nû de, lê hişmendiya desthilatdariya nû û ya Baas`ê weke hevin, tu guhertin pêk nehat. Di dema dawî de li beravê Sûriyê komkujiyên mezhebê derheqê pêkhateya elewî de pêk hat. Ji xwe yên komkujî pêk anîn jî hêzên girêdayî desthilatdariya Şamê bûn. Di wan komkujiyan de malbtin bi giştî hatin kuştin. Li gorî rewangeha mafê mirovan a Sûriyê li berava Sûriyê zêdeyê 1383 kes ji pêkhateya elewî  li ser destê hêzên girêdayî desthilatdariya Şamê hatine kuştin.

**Çîroka bi êş ya Dayika Eymen**

Zerga Sebahiya jineke ji mezheba Elewî ye, di kesayeta wê de wateyên qehremantî û berxwedanê ya dayika Sûrî hate nîşan dan. Wê tecrûbeyeke bi êş jiyan kir, malbata wê bi awayekî hovane ji hêla çeteyan di çarçoveya komkujiyên ku li berava Sûriyê pêk hat; hatin kuştin. Zarokên wê Kînan, Suhêl û neviyê wê hatin kuştin.

Di riya vîdyoyekê ku li ser medyaya civakî hatibû parve kirin, ku ev dayik li pêşiya laşê zarok û neviyê xwe sekiniye li hember hêzên çekdar, di vîdyoyê de çekdaran ji dayikê xwest ku laşê zarokê xwe bibe û bi awayekî bê rêzgirtin axaftin jê re dihat kirin. Li gorî rêveberê Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê Ramî Ebdulruhman, laşên wan ciwanan 4 rojan li erdê maye, dayika Eymen parastina laşê zarokên xwe dikir bi hêviya ku karibe wan oxire bike.

**‘Bûyera ku li berava Sûriyê çêbû li dervî wijdanê mirovahiyê ye’**

Jin Elewî Zerga Sebahiya “Dayka Eymen”ji rojnameya me re axivî û behsa serpêhatiyên xwe kir û wiha got: “Bûyerên ku li berava Sûriyê çêbûn li dervî wijdanê mirovahiyê ye, mirovê ku ji xwedan bitirse van kiryaran pêk nayne, zarok û naviyên min kuştin, komkujî pêk hatin û malbat bi temamî hatin kuştin. Gelên Sûriyê bi vî awayê hovan e kiryaran bi birayên xwe yên Sûrî re nake, ji ber ku em li ser hezkirinê mezin bûn e”

**‘Li hêviya pêkanîna dadmendiyê me’**

Dayika Zerga diyar kir ew ew li hêviya pêkanîna edaletê ye û wiha domand: “Me di jiyana xwe de tu kes ne êşandiye, tu guhnehê zarokê min tunebûn, dilê min şewitandin, em li hêviya edalet û cezakirinê ne. Divê rê li ber pevçûnên mezhebperestî û tundiyê bê girtin, destwerdana derve neyê qebûlkirin, gelê Sûriyê ji hev hez dike û rêzê ji hev re digrin.”

Di dawiya axaftinên xwe de dayika Eymen spasiya piştgirî û alîkariya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir û wiha anî ziman: “Em piştgirî û alîkariya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bîr nakin, ew xwdiyê xêr û aştiyê ji tevahî Sûriyê re ne.”

Hêjaî bibîrxistinê ye ku Netewên Yekbûyî jî tundiya li berava Sûriyê şermezar kiribû, herwiha gelek rewşên kuştina meydanî û malbatên bi temamî hatin qetil kirin belge kir.



# ‘Kêfo Osman çavkaniya dilsozî û wêrekiyê bû’

**Hêvî Keleş / Qamişlo**

**Kurê şehîd Kêfo Osman Hogir Osman û hevalê wî Hisên Osman diyar kirin ku şehadeta Kêfo Osman ji bo her kesê ew naskiribû, bû cihê xemgîniyê û wiha gotin: “Em ji Kêfo Osman fêrî dilsozî, biryardarî û wêrekiyê bûn.”**



Hisên Osman



Hogir Osman

Kêfo Osman ku li Qamişlo di sala 1965`an de ji dayîk bûye. Ew di malbatek e biçûk de ku ji dê û bav, sê bira û xuşkekî mezin bûye. Di 12 saliya wî de bavê wî jiyana xwe ji dest dide lewma gelek zehmetiyan di jiyana xwe de dikşîne. Ew ji zaroktiya xwe ve bi sporê ve mijûl dibe û tevlî gelek klûpên gokê dibe. Tîmek gokê bi navê juventos çêkiriye, tîma wî beşdarî gelek lîgeyan bûye û tê de bi ser ketiye. Ji 2005`an heta 2024`an gelek xelatên gokê bi dest xistine. Ew di encama dagirkirina dewleta Tirk ya faşîst û êrişên wê li ser Bendava Tişrînê şehîd ket. Wî heta kêliya dawiyê ji jiyana xwe têkoşînek bêhempa da meşandin.



Derbarê kesayet û bandora şehadeta Şehîd Kêfo Osman, hevalê wî Hisên Osman û kurê wî Hogir Osman ji Rojnameya me re axivîn.

Hisên Osman diyar kir ku Şehîd Kêfo Osman wek sêweyek feqîr jiyaye û ji bo jinavbirina xizaniyê têkoşiyaye û wiha got: “Alîkariya xizanan dikir, li zarokan xwedî derdiket, alîkariya koçber û malbatên şehîdan dikir, ji zarokatiya xwe de mîna bavekî bû û ferqa wan û zarokên xwe nedikir. Ew werzişvanek hêja bû û ji bo Klûba Al-Cîhadê hatibû vexwendin, lê şert û mercên wî pê re ne alîkar bûn. Ew dilgiraniya voleybolê bû û beşdarî hemû turnuvayên voleybolê bû, bi taybetî ji a Turnuvaya voleybolê ya Newrozê hezdikir. Wî ji serkeftinê hezdikir û hemû werzîşvan jê hezdikirin.




Di hemû lîstikan de mînaka zilambûnê û tesamuhê bû, wî nikarîbû xew kiriba ku du kes hene di nav lihevhatinê de ne an jî xemgîn in. Pênasekirina jiyan û kesayeta rêhevalê weke Kêfo Osman pir zehmet e ew heval û hogirê rojên giran bû. Herwiha di dema wî ya dawî de xwesteka wî ew bû ku heta karibe alîkariya kesên li dora xwe bike ji hemû aliyan de. Kesayeteke bibandor weke ya Kêfo Osman tucarî nayê ji bîrkirin û heta dawiyê em ê hewil bidin ku li pey doza wî bin.”

Di heman demê de Hogir Osman anî ziman ku bavê wî pir ji sporê hezdikir û pê mijûl bû û wiha got: “Bavê min jiyana xwe bi werzîşê qedand ku pir jê hezdikir û dema xwe pê derbas dikir. Li hemberî hemû astengiyên jiyanê her tim rûyê wî bi ken bû. Wî tîmek fûtbolê ji beriya 20 salan bi navê Juventos çêkirbû û ev tîm heta beriya ku jiyana xwe ji dest bide hebû. Herwiha ew kesayetek civakî û dilnizim bû, ku kî wî nasdikir jê hezdikir û rêz dida wî. Bandora şehadeta wî gelekî li hevalên ku pêre di karên werzîşê de kar dikirin hebû. Ew beriya ku berê xwe bide bendava şehîdan û şehîd bikeve, daxwaza wî bû ku di qada lîstikê de were gerandin û me ev daxwaza wî pêk anî.”



# Rêwîtiya Rojê didome

Rêwîtiya Rojê didome. Her sal bi hezaran kurd berê xwe didin Gundê Amarayê  û destê bi rêwîtiya Rojê dikin. Gelê Kurd rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wekî rojbûna xwe dibînin. Her sal 4’ê Nîsanê salvegera rojbûna Rêber Apo bi çalakî, meş, çandina daran û gelek bernameyên cuda pîroz dikin.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Rêber Apo herdem  jiyana  bi wate û mirovên bi wate diafirîne. Rêber Apo di 4’ê Nîsanê de hezkirin hêvî û jiyanek bi rûmet da avakirin û xweşik kir,  îro bi hezaran kes bi rojbuna Rêber Apo re ji dayîk dibin û xwe digîhinin armanca xwe, Rêber apo di nav zor  û zehmetiyan hebûnek da avakirin. Meha Nîsanê ji bo na gelê kurd wek meha Adarê meheke pir reng û nûbûna biharê di dilê gelan de geş dike. Kesayetên ku fikrê Rêber Apo xwendine û xwe bi fikirê wî re kirine yek hertim didin diyarkirin ku “Bi Rêber Apo re ji nûve şîn dibin û wek aveke bê sînor dimeşin kesên ku fikir û felsefeya Rêber Apo nasdike her di nava tekoşînê de dixwaze biherike”. Rêber Apo jiyanek bi ked û Hêvî da avakirin,  di nav çar dîwaran de 26 salin bê rawestan ji bo gelê Rojhilata navîn têdikoşe.

**Gundê Amara ji bo gelê kurd girîng û pîroz e**

Gundê Amara, li qadeke ku Torosa Navîn ji rojhilat ve digihîje deşta Mezopotamyayê, bi geliyan hatiye parçekirin û girên wê yên biçûk hene ava bûye. Gundê Amara yê li kevaneya ku Çemê Firatê ji 5 kîlometre dûrî wê ber bi başûr ve diherike cih digire, xwedî avhewayeke Derya Spî ya dereng e. Gund di heman demê de tam li nîvê herêma di dîrokê de jêre Kevana bi Bereket tê gotin hatiye avakirin. Welatê bi Kevana bi Bereket tê binavkirin, di dîroka qewm û neteweyan û bi taybet jî ya Kurdan de xwedî cihekî girîng û pîroz e. Bi sedê salan ev erdnîgariya giranbiha ji bo kesên li wir dijîn bû hêlîn û stargeh. Ev der gundê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e. Rêber Apo di 4’ê Nîsana 1949’an de li vê xaka pîroz hatiye dinê. Ji ber ku dibistan li gund tinebûye, Rêber Abdullah Ocalan li gundê Cîbînê xwend û ji bo biçe dibistanê jî her sibeh, nêzî 4 kîlometre rê dimeşe. Hê di wê deme de lîstîk, limêj û parvekirinê de pêşengtî dikir.

**4 Nîsanê zayîna gelê Kurd e**

Di 4’ê Nîsan’a 1949’an de, Rêber Apo li ser axa pîroz, afriner a pêxemberan hat dinya yê, li gundê Amara çavên xwe vekir. Bê gûman di serîde ji gelê kurd re û piştre jî ji hemû gelan re bû çavkaniya hêviyê û jiyana demokratîk. Bajarê Rihayê bi tîpên zêrîn, her daîm navê xwe li ser rûpelê dîroka hemdem daye nivîsandin. di bajarê Rihayê de gelek pêşeng derketin ser dika dîroka Rojhilata Navîn pêşengên mîna hezretî Îsa û Eyûban jî li ser wî axa pîroz tekoşîna xwe dane meşandin. Rêber Apo jî bi navê xwe yê zêrîn, li ser axa bajarê Pêxemberan da nivîsandin û bû Rêberê hemû civakên aşitîxwaz. Rêber Apo dema ku çavê xwe li cîhanê vedike dibîne ku  civakek a zordaran hatiye avakirin, di wî deme de biryara tekoşînek mezin dide ku li hemberê zordaran şerê heqîqetê bide meşandin. ji bo ku civakek azad bide avakirin. Di roja me ya îro de jî dema em mêyzedikin civaka aşitî xwez jî berê xwe dide ramanê Rêber Apo. ji ber ku Ramanên Rêber Apo di zanista xwe ya çandî û civakî de  heta dawiyê  xwedî zanist û berhemên nûye. Gelek mirovên şorşeger li ser vê axa pîroz têkoşîna xwe dane meşandin, lê belê nebûn xwediyên ramanên birdoziyeke kûr. Ji bo ku mirov bibe xwediyê birdoziyekê kûr, divê xwe di rastiyên civakbûniyê de kûr bike û wate li jiyana mirovan bide barkirin.

**Jin bi zayîna Rêber Apo re xwe ji zîncîrên koletiyê rizgar kir**

Rojbûna Rêber Apo hemû cîhanê geştir û ronî kir. bi zayina Rêber Apo re mezinbûn,firehbûna tekoşîna azadiya jin hîşt ku jin xwe ji zîncîrên koletiyê rizgar bike.  Zayina Rêber Apo di asta gerdûnê de xwedî derktinek ewqas mezin bixwe re anî. Gelê Kurd ji ber ku têkoşîn, felsefe û bîrdoziya Rêber Apo dipejrîne û jê bawer e,4’ê Nîsanê roja rojbûna Rêbertî, weke xilasiya xwe û hêviya xwe ya wenda bûyî dibîne. Ji ber ku hebûna Rêber Apo bû hebûn û vejîna gelê Kurd. Çawa ku di her welatekê de, di her civakekê de rojên taybet yên pîroz hene, ji bo gelê Kurd jî ev roj rojeke taybet e. Wetaya vê rojê ji bo gelê Kurd û jinan pir cuda ye. Ji ber bîrdoziya Rêbertî xwe dispêre azadiya jinê û azadiya gelan. Jina ku bi pergaleke pir wehşî dihat perçiqandin, tinekirin û bênasname hiştin bi bîrdoziya Rêbertî re pênaseya xwe dît. Tu serok û tu rêber mîna Rêberê gelê Kurd bi jinê re hevaltiyeke ewqas kûr ne daye nîşandan. Hevaltiya Rêber Apo bi jinê re piralî û li ser asasê azadiya jinê û civakê ye. Rastiya xwe naskirin,  hêza xwe dîtin û ji bo vê têkoşîn kirina jinan bi naskirina Rêbertî re pêşket.

**21 salin Rêwîtiya rojê didome**

Gelê Kurd ji 2004’an ve her sal 4’ê Nîsanê roja Rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tevî hemû astengiyan bi girseyî û bi coş pîroz dike. Rêwîtiya Rojê 21 sal in bê navber didome. Her sal bi hezaran kurd berê xwe didin Gundê Amarayê û dest bi rêwîtiya Rojê dikin. Gelê Kurd rojbûna Rêberê Apo wekî rojbûna xwe dibînin. Ji 2004’an heta niha her sal 4’ê Nîsanê salvegera rojbûna Rêber Apo  bi çalakî, meş, çandina daran û gelek bernameyên cuda pîroz dikin. Bi hezaran welatî ji sala 2004’an heta 2017an ji bo biçin Amara û rojbûna Rêber Apo pîroz bikin tevî hemû astengiyan meşên girseyî li dar xistin. Bi hezaran kes li gel nûnerên saziyan ji bo 4’ê Nîsanê pîroz bikin bi dirûşma “Azadiya Rojê” berê xwe dan gundê Amara û dest bi “Rêwîtiya Rojê” kirin. Piştî darbeya 15’ê tîrmeha 2016’an û şûnde desthilata AKPê OHAL hincet nîşan da û ji 2017an û vir ve 8 sal in astengiyan derdixin û ketina gund qedexe dikin. Lê her çend ketin û derketina Amarayê qedexe bikin û herêma qedexe îlan bikin jî dîsa Kurd xwe digihînin Amarayê û li Amara Rojbûna Rêber Apo pîroz dikin.





**Şehîdên Amara yê Mustafa Dag û Mahsum Karaoglan**

Di 4ê Nîsana 2009’an de dîsa bi hezaran berê xwe dabûn Amareyê û meşiyabûn Amarayê. Bi hezaran welatî 25 kîlometre beriya bigêjin Amarayê, polîs û leşkeran bombeyên gazê avêtin ser girseyê. Di êrîşan de bombeya gazê li serê Mustaf Dag (27) û Mahsum Karoglan (21) ketibû. Di encama êrîşa leşkeran a li dijî meşvanên Amarayê de Mustafa Dag û Mahsum Karaoglu jiyana xwe ji dest dan. Nêzî 60 kesên din ên birîndar bûn rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Rihayê û Bîrecîkê. Bi deh hezaran welatî li nêzî Xalfetiyê kom bûn û xwestin bimeşin Amarayê. Lê dîsa polîsan bi guleyan mudaxale kir.

Di 4’ê Nîsana 2010an de zêdetirî 10 hezar kes tev li meşê bûn. Gel posterên Abdullah Ocalan, wêneyên Mahsûm Karaoglan, Mûstafa Dag û alên konfederalîzmê, posterên Mazlum Dogan û Orhan Dogan hilgirtin. Gelek hunermendên NÇNê derketin ser dikê û stran gotin. Li ser navê girsê 900 kes çûn gundê Amarayê. Heyeta ku diçû Amarayê, di rê de li cihê ku Mustafa Dag û Mahsum Karaoglan di “Meşa Amara” de ji aliyê leşkeran ve hatin kuştin rawestiyan, bi qurnefil û gulan Dag û Karaoglan bibîr anîn.

**Meşa azadiyê îsal jî pêk were**

Sala 2024an bi taybetî piştî pêngava “Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî” ku di 10’ê Cotmeha 2023an de li sedan welatan dest pê kir û li Ewropa û Bakurê Kurdistanê “Meşa Azadiyê” pêk hatin, kelecana gel zêdetir bû. Îsal jî piştî peyamên Rêber Apo ên 27ê Sibatê û 8’ê Adarê tevlêbûna 8’ê Adarê û Newrozê zêde zêdetir kir. Girseya ku tev li pîrozbahiyên 8ê Adarê û Newrozê bû, bêtir girêdana xwe ya bi Rêber Apo re anî ziman. Ev tevlêbûna gel a 8ê Adarê û Newrozê nîşan dide ku dê îsal Meşa Amara jî bi coş û girseyî derbas bibe. Ji niha de amadekariyên 4ê Nîsanê dest pê kiriye.  Meclisa Ciwanan a DEM Partiyê bi minasebeta 76’emîn salvegera Rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, dê bi dirûşma “Em bi Civaka Demokratîk Ber Bi Azadiyê ve Dimeşin” di navbera 1 û 4ê Nîsanê de ji Amedê ber bi gundê Amarayê yê Xelfetî ya Rihayê ve bimeşin.

# Zîwer Şêxo: Kiryarên li Beravê qirkirina mirovahiyê ye

Rojnamevan û yek ji çavdêrên karwanên alîkariyê Zîwer Şêxo anî ziman ku gelê Elewî li ber çavê cîhanê tê qirkirin û got: "Ji bo komkujî neyên belgekirin, nahêlin ku dezgehên ragihandinê derbasî Berava Sûriyê bibin."

**Argêş Viyan/Qamişlo**

Derbarê kiryarên komên çekdar yên ku li Berava Sûriyê, herwiha karwanên alîkariya mirovî ku ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo xelkê beravê hate şandin, rojnamevan û çavderê siyasî Zîwer Şêxo pirsên rojnameya me bersivand û naveroka hevpeyvînê wiha bû:



**-6'ê Adara 2025'an li ser bangawaziya pêkhateyên li herêmên Berava Sûriyê karwanên alikariyê ji herêma Rêveberiya Xweser ber bi herêmên Beravê ve bi rê ket. Hûn weke endamekî konvoyê û weke rojnamevanekî dikarin çavderiyên xwe bînin li ser ziman?**

Weke tê zanîn li piştî ruxandina rejîma Baas gelek alozî û qirkirin li ser tevahî pêkhateyên Sûriyê hat meşandin. Taybet li Beravên Suriyê, bi navê "Bermahiyên Esed" li ser pêkhateyên Elewî gelek zext û tûndî hat meşandin. Ji bo alîkariya gel li beravê û belgekirina sûcan daxwaz û pêşniyar hat kirin. Rêveberiya Xweser jî li gorî wê pêşnîyarê insîyatîfekî gelerî avakir û şande beravên Sûriyê. Destpêkê hikûmeta Şamê ya nû ji bona alîkari erê kir, lê piştre jî gavek paşde avêt û gelek astengî pêşiya karwanê alikariyê we hat derxistin. Lê tevî hemû astengiyan karwan gehişte beravê û alikariyê gele herêmê re belav kir. Li xalbendendên kontrole ya girêdayî hikûmeta Şamê ve bi li ser bingeha ku logoyên Heyva Sor bê rakirin destur da ji bona karwanên alikariyê derbas bibin. Ji bona ku alîkarî derbasî gelê Beravê bibe di aliyê nûnerên karwanê ev yek hat pejirandin. Di hejmara 17 erebeyên ku hemû bajarên Rojavayê Kurdistanê pêkdihatin pêdiviyên jiyanî tê de cîh digirtin, derbasî herêmên Berava Sûriyê bûn. Me gelek bajarên Sûriyê yên ku êrîşê dagirkeriyê pêkdihatin me alîkarî belav kir. Bajarê Hemayê astengî derxistin ji ber ku hinceta qaşo cebilxane û çek di nav karwanên alikariyê de hene kirin. Ev jî bû sedem ku karwanên alikariyê demê xwe de negihijin cihê xwe. Di aliyekê din jî xalbendên kontorolê de me metîrsî jiyan kir ku di aliyê endamên hikûmeta Şamê ve cebilxane bixin nav karwanên alîkariyê de, ji bona negîhîje encama tê hêvî kirin. Alikarî seranserê bajarên Beravê hatin belav kirin. Bajarê Ceblê yê Beravê gundê binavê Sêrekaniyê gelek welatî tevlî kar bûn. Gelê Beravê endamê karwanên alikariyê xweş pêşwazî kirin û roj biroj malakê mêvan dihatin kirin. Gelê Beravê digotin "me hebûna xwe bi Rêveberiya Xweser ve dît" aliyê mirovî wê karwanê pir zêde kete pêş. Ez dikarim wisa çavderiyê xwe bînim li ser ziman.

**-Weke tê zanîn gelek malbatên pêkhateyên Elewî û bawerîyên cûda di qirkirinê de hatin derbaskirin. Malbatên ku hûn rastî wan hatibûn hebûn û hûn dikarin çaveriyên xwe bînin li ser ziman?**

Armanca me ew bû ku em bûyerên wir diqewimin bi şêwazekê rast bigihînin raya giştî. Dema em ji bajêr derbasî gunda bûn zext li ser gel zêdetir dihat kirin û mijarên tûndî zêdetir derket pêşîya me. Li serlêdanên me yên gundan me dît ku em cihekê ku mirov her demijmêr rûbirû qirkirinê dimînin. Li wir şanoya kujerêyê dihat meşandin û dihate pêşvebirin. Ev gundê me dîtîn xwîn û malên ku hatibûn şewitandin û di heman demê de cenazeyên li erdê hatin dîtîn û hatin belgekirin. Dayikekî Elewî anî ziman ku 4 zarokê wê li ber çavê wê hatine qetilkirin. Malbatan gotin ku ku çeteyan ji me pirs dikir "Hûn Sûnnî ne an Elewî ne?" li gor wê jî qirkirin û zext li ser me dian meşandin. Qûrbaniyên qirkirinê hejmarekî mezine û ti sazî û dezgehên mirovî serlêdan wan herêman ne kiri bû. Ji ber metirsîya komkujî û qirkirinê gelek zilamên Elewî çolistanên Sûriyê dirazin ji ber ku rastî qirkirinê neyên. Kiryarên ku li Berava Sûriyê tê meşandin, hişmendiya rastî ya desthilatiya Şamê ye. Ev alîkarî hênasekê mezin ya derûnî û baweriyekî mezin xiste nav civak ê. Malbatên ku alîkarî wan hat dayin derfetên xwe yên jiyanê hemû winda kirin e. Tenê ne kuştin û komkujî di heman demê de jî, dîzî û talan jî gelek li ser gelê Elewî dane meşandin. Ger ku hejmarên pêkhateyan zêdetir ba, dê komkujî zêdetir be.

**-Astengiyên derketin pêşiya we dema rêwîtiya ber bi Berava Sûriyê û dema belavkirina alîkariya mirovî çi bûn?**

Astengiya herî mezin ev bû ku li arê ku ji bona ku welatî bikarin pêdîvîyên nan pêk bînin û nan çêbikin 350 ton û 6 hezar û 35 paktên pêdivîyên xwarin û paqijiya rojane hatibû birin. Lê gorî pêwistiyên welatiyên li wir pir kêm û nebes bû. Ji ber ku herêm hejarî û nebesiyê derbas dibê, ji wê ye ku ev hejmara ku hatibû diyarkirin di aliyê rayedarên hikûmeta Şamê we hate redkirin. Ji ber wê me astengî û zehmetiyekî herî mezin jiyan dikir ku me bi wê hejmarê nedikarî pêdiwîyên hemû welatiyan bicîh bînin. Me jî biryar da ku malbatên ku herî zêde komkujiyê rast hatibûn di alikariyê de sereke ev bin. Rewşa qirkirin û komkujiyê niha jî berdewam e û bi dawî nebûye û dema em li wir jî ev rewş weke komên alikariyê li ser me metirsî ava dikir û ne ewlekarîya me weke kom hebû, ne jî ewlekariya gele herêmê hat pêkanîn.

**-Çûyîna karwanên alîkariyê Bandorekî çawa li ser gelê herêmê da avakirin?**

Ev alîkarî hênasekê mezin ya derûnî û baweriyekî mezin xiste nav civak ê. Malbatên ku alîkarî wan hat dayin derfetên xwe yên jiyanê hemû winda kirin e. Tenê ne kuştin û komkujî di heman demê de jî, dîzî û talan jî gelek li ser gelê Elewî dane meşandin. Ger ku hejmarên pêkhateyan zêdetir ba, dê komkujî zêdetir be. Ev alîkarîyê mirov dikare dualî bigire dest; yek mirovî aliyê duyem jî, derûnî li ser civakê avakir. Ji ber ku derveyî sazî û dezgehên Rêveberiya Xweser ti welat û saziyên din alîkarî ne dan civak û gelên Berava Sûriyê. Ji ber wê bi şanazî û keyfxweşiyekê mezin karwan hatin pêşwazî kirin û alîkarî hatin belav kirin. Gelek aliyên li herêmê digotin "Em çiqasî hewcedarî alikariyê bûn, evqas jî, hewcedarî hatine ve bûn. Dema hûn li wir bin em xwe ewle hîs dikin" Gelê herêmê me daxwaz dikirin ku em mayina xwe dirêjtir bikin. Endamên wê karwanê jî endamên pispor û saziyên mirovî yên Rêveberiya Xweser pêkdihatin derûniya herêmê nêz ve nasdikirin ve pêk dihatin. Ji ber ku Rêveberiya Xweser ya gelên tevahî Sûriyê ye.



**-Hûn jî weke endamekî karwanên alikariya mirovî rastî tûndî û zextê hatin û hatin binçavkirin. Demê binçavkirinê de çi li ser we hat ferzkirin û nêzîkatî li hemberî ve çawa bûn? Peyamekê we heye yên ji bona dawîkirina qirkirin û komkujiya gelên herêmê?**

Weke rojnamevanekî li ser şopa Ragihandina Azad û dengê rastiyê me ev kiryar bi çavê xwe dîtin û nekarin ku wan kiryarên dervî mirovî ji ber metirsiya jiyanî nekarî belge bikin zext li ser me hate kirin. Taybet ev kiryarên ku gundê Muxtariyê hate kirin, ji bona wî me weşana zindî li gel navenda Ronahî Tv kir û xizmên qurbanî û yên li rastî tûndiyê hatin me hevpeyvîn çêkir û nêrînên wan girtin. Em yekem dezgehê ragihandinê bûn ku me dikarî wan kiryaran bikin rojeva cîhanê. Piştî weşana zindî em hatin binçavkirin û çend seetan li bin çavderiyê de hatin hiştin. Pirsa yekem hate kirin ku; Rojî digirim an na? Pirsa duyem jî ev bû ku; ez Elewî an Sûnnî me? Min pirsa wan ya duyemin ne bersivand, ji ber ku ev pirsekî nijadperestî bû. Piştî çend demijmêran em hat azad kirin. Alavên me yên teknîkî weke telefon û kamiraya me hat desteser kirin. Ev nîşaneya êrîşên li ser çapemeniya azad û dengê rastiyê ye. Em jî weke endamên ragihandina azad dê hertim bibin dijminê qirkirin û komkujiya gelên cîhanê û dengê rastiyê derrbixin holê. Pêwiste hikûmeta Şamê ger dibejê min hişmendiya xwe guhertiye divê destur bide dezgeh û saziyên mirovî û ragihandinê biçin herêmê, ji bona rastiya ku heyê li raya giştî bidin xuyakirin.



# Rojbûna Me Pîroz Be!



**Sînan Cûdî**

4'ê Nîsanê ji bo gelê Kurd ne tenê rojbûna gelê Kurd e, di heman demê de dîrokeke sembolîk a têkoşîna azadiyê ye. Rojbûna Rêber Abdullah Ocalan, weke roja ku berxwedan, fikir û paradîgmaya ku di şexsê wî de şîn bûye, watedar dibe. Ocalan ne tenê serokekî takekesî ye, di heman demê de di lêgerîna gel a berxwedan û azadiyê de jî xala veguherînê ye. Têkoşîna wî di esasê xwe de polîtîkaya înkar û tinekirina Kurdan a sed salî hejand û paradîgmaya şoreşa demokratîk a ku ji Kurdistanê belavî cîhanê dibê ava kir.

Siyaseta înkar û îmhayê ya sed salê xwe derbas kiriye, ji Împaratoriya Osmanî heta Komarê mîras maye û bû siyaseta bingehîn a Komara Tirkiyeyê jî. Siyaseta redkirina nasnameya kurd, tinehesibandina ziman û çanda wê, desteserkirina erdnîgariya wê bi awayekî sîstematîk dewam kir. Têkoşîna gelê Kurd a ji bo parastina hebûna xwe bi dehan salan hat tepisandin, serhildan di xwînê de xeniqîn. Lê belê Rêber Ocalan, bi pêvajoya rêxistinî ya di destpêka salên 1970'yî de dest pê kir, karîbû vê zincîra înkar û îmhayê bişkîne. Bi damezrandina PKK'ê re tevgera azadiya gelê Kurd a siyasî, leşkerî û civakî hate destpêkirin. Ev tevger ne tenê têkoşîna nasnameya etnîkî ma; bû dengê lêgerîna herî bingehîn a mirovahiyê ya azadî û wekheviyê.

Gelo emê vê jidayikbûnê divê çawa fêm bikin? Çawa pênase bikin?

Rêber Apo, di parêznameyên xwe de jiyan û têkoşîna xwe di sê qonaxên bingehîn ên jidayikbûnê de pênase dike.

Jidayikbûna yekem wekê jidayikbûna xwe ya 4'ê Nîsana 1949'an de li gundê Amara yê navçeya Halfetî ya Rihayê pênase dike. Rêber Apo, di nav jîngeha jiyana gundî ya sade û xwezayî de mezin dibe, di temenê biçûk de li dijî şêwazên ku ji aliyê pergalê ve hatine ferzkirin serî radike. Li hember qirkirina ziman û çanda kurdî serhildanên destpêke li dar dixe. Nakokîyê bi nîzama heyî di vê serdemê jidayikbûnê de ye.

Jidayikbûna Duyemîn jî ji salên 1970'an de dest pê kir û heta sala 1999'an dewam kir. Bingeha vê pêvajoyê jî têkoşîna şoreşgerî bû. Di vê qonaxê de damezrandina PKK'ê, têkoşîna gerîla, Bûna tevgereke gel û pêşxistina xeta îdeolojîyê bû. Di vê serdemê de Rêber Apo, dibe pêşengê têkoşîna hebûn û azadiyê ya gelê Kurd.

Jidayikbûna Sêyemîn jî ji sala 1999'an ku bi komployeke navneteweyî li Îmraliyê hat girtin hildigre nava xwe. Di vê merhaleyê de komployên li dijî gelan hatiyê li darxistin pûç kir û li dijî modernîteya kapîtalîst Paradîgmaya Civaka Demokratîk, Ekolojîk, Azadiya Jinê pêş xist. Ev paradigma weke modeleke alternatîf li dijî sîstema dewlet û desthilatdarîyê ket merîyetê. Ev paradîgmaya ku li Îmraliyê pêşxist, ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo hemû mirovahiyê di lêgerîna azadiyê de bû hêviyek.

Ev Paradîgmaya Civaka Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya Jinê, alternatîfa modernîteya kapîtalîst û yekdestdariya netewe-dewletê temsîl dike. Pêşxistina civaka demokratîk ji pêşxistina îradeya meclîsên gel, komun û kooperatîfên xwecihî yên rêxistinkirî pêk tê, ne bi desthilatdariya navendî.

Civaka ekolojîk li ser hevsengiya mirov û xwezayê, li dijî talankirina xwezayê ava bûye. Li şûna pergala hilweşîner a kapîtalîzmê ku li ser çavbirçîtiya qezencê ava dike, şêwazek jiyanê ku hevsengiya ekolojîk diparêze pêşniyar dike.

Azadiya jinê jî wekê bingeha paradîgmayê bi dest digre. Rêber Apo tim dibêje, koletiya jinê çavkaniya hemû koletiya civakî ye. Ji ber vê yekê azadiya jinê jî bingeha civaka demokratîk ava dike.

Li ser vê paradigmayê sîstema rêveberî jî şênber bûye; Netewa Demokratîk. Sîstema neteweya demokratîk li dijî modela netewe-dewletê projeyek li ser jiyana hevpar a gelan e. Li hemberî ferzkirina zimanekî, yek nasnameyê û yek baweriyê, modeleke civakî ya bi nasnameyên piralî, pir zimanî û pirçandî tê pêşbînîkirin. Bi taybetî di Şoreşa Rojava de ev model bi awayekî şênber hate pêkanîn û bersiveke pratîkî dît. Meclîsên gel, konfederalîzma jinan û rêveberiyên xweser ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ronîkirina paradîgmaya neteweya demokratîk a Rêber Apo ye.

Ji vê pênaseye kin jî tê fêmkirin ku rojbûna ku em her sal pîroz dikin ne tenê jidayikbûna mirovek e. Em bi vê pîrozkirinê nirxên mirovahîyê û gelên xwe pîroz dikin. Hêvî, daxwaz û xeyelên bindestan dikin rastîyekî ku dibê bê pêkanîn. Û wekê gelên Bakur û Rojhilatê Sûrî ev pîrozkirin ji bo me bi watetir e.

Erê, 4'ê Nîsanê rojbûna Rêber Abdullah Ocalan e. Lê ne tenê jidayikbûna mirov, di heman demê de jidayikbûna fikir û têkoşîna azadiyê ye. Fikrên ku di şert û mercên giran ên tecrîdê yên li Îmraliyê de pêş xistin, sînoran derbas dike û bi mîlyonan mirovên li çar aliyê cîhanê li azadî û demokrasiyê digerin ronî dike. Têkoşîna Rêber Apo, ji bilî berxwedana hebûn û azadiyê ya gelê Kurd, di lêgerîna mirovahiyê ya wekhevî, edalet û azadiyê de weke çandekî berdewam dike.

Îsal jî ji 8ê Adarê, 21ê Adarê û cejna mibarek de hemû gelên me bi yek dengî azadîya Rêber Apo xwestin. Hemleya Ji Rêber Apo re Azadî Ji Pirsgirêka Kurd Re Çareserîya Sîyasî bi van çalakîyan hat pîroz kirin û daxwaz hatin nû kirin. Gotin di cih de be, ala têkoşînê hat bilindtir kirin. Bi vê şeklî stratejîya me ya sala nû jî dîyar bû.

Bi vê munasebetê ez careke din Rojbûna Me Pîroz Dikim û di serî de gelê Kurd, bang li hemû azadîxwaz û demokrasîxwazan dikim ku di rojbûna Rêber Abdullah Ocalan de vê berxwedan û paradîgmaya mezin hembêz bikin.

Da ku cîhana ku bi felsefeya wî hatiye rizgarkirin wê ji bo hemû gelên bindest û jinan bibe hêviyê.

## Pêdiviya mezin bi çalakiyên ronakbîriyê heye

**Zekî Bedran**



Li gorî daxuyaniya Şamê di bin serokatiya Ahmet Şara de hikûmeta nû hat avakirin. Berê çi hatiye kirin tê zanîn. Şara di civîneke leşkerî de bû serok. Desteyekî ku ji aliyê HTŞ'ê ve hatiye erkdarkirin makezagona demkî amade kiribû. Desteyekî ku ji aliyê HTŞ'ê ve hatiye avakirin jî kongreya neteweyî pêk anî. Ev kiryar ne di bin çavderiya raya giştî de ye, raste rast kiryarên bi hişmendiya derbewarî ne. Gelên Sûriyeyê bi bûyereke ku hatiye kirin û çêbû re rû bi rû yê hiştin. Derfetên ku ji Ahmet Şara re hatine dayîn li ti welatekî demokratîk nîne û hebûna wê jî ne pêkan e. Weke rejîma Baasê ew rayeyên ku dane dîktatorekî, dane serokkomar. Destûra bingehîn a demkî di nava rewşenbîr, parêzer û derdorên siyasî de nehatiye nîqaşkirin. Destûr peymanên civakî ne. Divê bi nîqaşên gel bê kirin û bi mehan bigihêjin encamekê. Divê mafên hemû beşên civakê bigire nava xwe. HTŞ her tiştî li gorî berjewendiyên xwe diafirîne. Ew beşên mezin ên civakê paşguh dike. Ya herî xirab ew e ku ew bi zanebûn komên hatine rêxistinkirin ji derveyi pergalê dihêlin.

Hikûmeta ku hatiye ragihandin wê bi salan li Sûriyeyê bi rêve bibe. Lê ji bilî HTŞ'ê, partiyên din, yên xwedî nêrînên cuda, pêkhateyên û hwd. Hişmendîyekî bi giştî tûndî û yekdest e. Hemû kombûn û destkeftiyên şoreşê yên Sûriyeyê ji aliyê HTŞ'ê ve tên desteserkirin. Weke ku ev şoreş şoreşekî tenê ji aliyê HTŞ'ê ve hatiye kirin didin xuyakirin. Lê Kurd, Durzî, Siryan-Asûrî, rewşenbîr û komên mezin li dijî Baasê li berxwe dan û şer kirin. HTŞ li tenê Idlibê bi bandor bû. Lê HTŞ weke ku hemû Sûriye alîgirê wan e û ji bilî wan ti kes heq nake ku beşdarî rêveberiyê bibê tevdigere. Rêya ku HTŞ dişopîne bi tevahî dijî demokrasiyê ye. Li şûna pergala Baasê pergala xwe ava dike. Bi rêbazên nîjadperest bi vê yekê dike. Destûr nade hawirdorên nîqaşa demokratîk. Rêvebiriyeke zelal û giştî nîne. Nîqaşên bi dizî tên kirin, biryarên ku didin radigihînin û li ser raya giştî ferz dikin. Niha jî çapemeniya ku ji Baasê mîrate maye bi kar tînin. Ev çapemenî ji raya giştî, rewşenbîr û kesên xwedî nêrînên cuda re girtî ye. Civak bi siyaset û propagandayên yek alî tê meşandin.

Nûçeyên ku komkujiyeke giran a li dijî Elewiyan hatin kirin li cîhanê deng veda. Hat ragihandin ku ji bo lêkolînkirina van komkujiyan destyek hatiye avakirin. Yê ku deste wesaz kiriye Ahmet Şara bi xwe ye. Heman kes e ku biryara êrîş û operasyonên li dijî Elewiyan daye. Kî bawer dike ku ev deste bi rastî lêkolîneke serbixwe bike û encamên wê wek xwe ji raya giştî re were eşkerekirin? Divê ev deste di nava Neteweyên Yekbûyî de bihata avakirin. Wek hûn jî dibînin HTŞ di her warî de xwe lêdide û dilîze. Bi Rêveberiya Xweser re peymanek hate îmzekirin. Nêzîkî ji sê beşên gelên Sûriyê li herêmên xweser dijîn. Li vir gel xwe birêve dibe. Rêxistinek wê heye. Agahiyên herêmên Rêveberiya Xweser jî ji vê hikûmeta nû hatiye avakirin nîne. Jixwe çi danûstandin jî ev pêk ne hatin. Durziyan jî daxuyanî da û got ku ev hikûmet nûnertiya me nake. Ji hikûmetê jî ne agahdar bûn. Rewşa Elewiyan diyar e. Civakên wekî Asûrî, Suryanî û Ermenî jî ji van biryaran tên dûrxistin. Di vê rewşê de hikûmeta ku ji aliyê Ahmet Şara ve hatiye ragihandin dê çawa nûnertiya gelê Sûriyê bike?

DYA, Îngilîstan û welatên Ewropayê ji nêz ve bi Sûriyeyê re eleqedar in. Weke ku tê dîtin bi rêveberiya Şamê re peywendîya wan hey e. HTŞ ji lîsteya rêxistinên terorê dernexistin. Ambargo jî ranekirin. Ew destnîşan dikin ku ew hîn jî ji HTŞ bawer nakin. Lê ew di heman demê de temaşevaniya HTŞ dikin ku hikûmetek despotîk a pir navendî ya li ser bingeha mezhebe li Sûriyê çawa ava dike. Bêdengiya wan a li hemberî makezagona demkî ya ku ji aliyê HTŞ'ê ve hatiye ragihandin jî gelekî cihê fikirînê ye. Ev pêşnûmeya makezagonê li dijî Sûriyeya demokratîk e. Wan destnîşan kir ku divê ol bingehê Destûra Bingehîn be û serokomar jî Misilman be. Em nizanin HTŞ bi DYA û Îngilîstanê re çi li hev kiriye, şert û mercên wan çi ne? Dixwazin Rêveberiya Xweser û hêzên din bi HTŞ re peywendiyan danin û hevbikin. Lê HTŞ li şûna ku dewleteke demokratîk ava bike, dewleteke hişmendiyekî serdest û olî ava dike.

Her wiha diyar e ku ev dewlet wê ji hişmendiya Baasê, tûndttir zordartir û qedexeparêztir be. Dibêjin gundê ku tê xuyakirin rêzanan naxwaze. Eşkere ye ku HTŞ hewl dide dewleteke çawa ava bike. Civaka Sûriyê yên ku li dijî avakirina dewleteke ji Baasê xerabtir in, divê beriya ku dereng be tevbigerin û xwe rêxistin bikin. Gelê Sûriyê ne rêxistinkirî ye. HTŞ jî hewl dide vê veguherîne firsendekê û xwe birêxistin bike. Di civaka ku bi salan e di bin zexta Baasê de jiyaye çanda demokrasiyê nîne. Di vî warî de rewşenbîr û hêzên ku daxwaza demokrasiyê dikin divê bi lez xwe birêxistin bikin. Bê guman rêxistinbûn bêyî hişmendî çênabe. Di vî warî de perwerdekirin û ronîkirina gel di nava karên sereke de ye. Divê li Sûriyeyê têkoşînekî berfireh a siyasî-îdeolojîk bê ku dereng bibe pêwîste were meşandin.

## Derew, hîle û çokdanîn…



**Farûk Sakik**

Hemû serhildanên Kurdistan dişibin hev. Destpêk û aqûbetên wan bi trajediyên mezin bi dawî bûne. Ev kevneşopiya dewletê di Komkujiyên Qoçgirî, Şêx Seîd, Agirî, Zîlan û Dersimê de xwedî rabirdûyeke qirêj a tijî hîle û lîstikan e. Îroj dixwazin ew kirasê serhildanên berê, li PKK'ê kin. Serhildana dawî, serhildana PKK'ê ji bo neşibe aqûbeta serhildanên berê siyaseteke hûr û kûr dimeşîne. PKK'ê ew derew û hîleyên dewleta Tirk ku Seyîd Riza dîtibû û li hember wan çok danenîbû, ji xwe re esas girtin. Li hember van derew û hîleyan têkoşîneke bê hempa dabûn.

roj devleta Tirk, dema ku bi derew û hîleyên xwe encam negirt, bi Kurdan re pêvajoyeke nû da destpêkirin. Lê anha dixwazên bi Kurdan çok bidin danîn. Herî dawî gotinên xwe yên 3 mehan dubare dikin. Erdogan di peyama xwe ya cejna Remezanê de dîsa got; PKK bê şert û merc xwe fesix bike û çek berde. Bahçelî li nexweşxanê û heşê wî li serê wî ye an na em nizanin, dîrok û cîhê (Milazgir-4 Gulan) kongreya PKK'ê nîşan kiriye. Û lê zêde dikin dibêjin; "dema me nîne, demildest ev kongre were lidarxistin" her weke ku hemû berpirsyariya xwe pêk anîne û PKK ev pêvajo dayî xitmandin, diaxivin.

Bi van peyamên xwe dixwazin PKK'ê teslîm bigirin, di nav civaka Kurdan de rencîde bikin, di nav civaka Tirkiyê de xwe serketî nîşan bidin. Piştî têkçûna xwe ku xwe spartin Kurdan, vedişêrin. Ango hevoka Seyît Riza a duyemîn (…çok danîn….) dixin meriyetê. Dest bi gefxwarinê kirine. Di destpêkê de bi Rêber Apo re lihevkirinek wan hebû. Ji bo aşitî û demokrasî li vê axê pêk were. Ji bo zêde êş neyê kişandin, di rêya aştî û civaka demokratîk de gava yekem paqijkirina rêyan bû. Pêngava duyemîn jî çêkirina rêgezên demokratîk û qanûnî bû. Heger van yekan pêkbihatina, wê ewlehiya qanûnî û destûrî bida pêvajoyê. Ev yek pêk nehatin. Li şûna van bikin; Gotina "Bang hatiye kirin, divê demildest roja kongreyê diyar bike, kongreya xwe bicivîne, xwe fesix bike û çekan deyne"

Ev zîhniyeta wan, ji serhildana destpêkê, ku ev 100 sal in tu xerabî ji Kurdan re nehiştiye, ji Îttîhad û Terakkî dest pê kiriye û bi netewdewletê dewam dike. Encama ku em dikarin ji van hemûyan derxin ev e; Armanca sereke ya hikûmeta îro, tunekirina nirxên neteweyî yên kurdan e. Rastî ew e ku bi zîhniyeta qirkirinê bi armanca tasfiyekirinê nêzî pirsgirêk û pêvajoyê dibin. Rayedarên PKK'ê jî ev derew û hîleyên wan dîtin û ji bo li pêş wan, çok daneynîn di daxuyaniyên xwe de dibêjin; "Em li gor bang û paradîgmaya Rêber Apo tevdigerin. Li ser daxwaza we, em kongrê kom nakin û wan biryarên dîrokî nadin. Rêber Apo ev rêwitiya dîrokî da destpêkirin û heger rê were guhertin, rêwîtiyek nû dest pê bike, divê Rêbertiya me aktîf di vê biryarê de cîh bigire."

Piştî Rêber Apo dîl hat girtin dîsa PKK'ê kongre li dar xist. Lê ev kongreya îro, ji wan cûdatir e. Biryarên ku qedera gelan biguhere di vê kongrê de wê bên girtin. Di vê kongrê de dema herkes kom bû, Rêber Apo paradîgmaya xwe bi wan re parve bike. Gerîla û kesên tevlî vê kongrê bibin bi tenê tiştek dixwazin deng û dîmenê Rêber Apo ye. Ji bilî 'deng û dîmenên Rêber Apo' her tiştî wek kevneşopiya dîrokî ya 'derew û hîleyên' dewleta Tirkiyê dibînin.